

B4-Dema nûçeyek bighe me ku kesek ji bal dezgehên parastinê ve hatiye girtin, em wê nûçeyê di malpera xwe de belav dikin, ji ber ku em dibînin eger girtin hebe, divê ew ji bal dadgehêve be, û li gor doznameke dadwerî be, gerek dadgehên awarte û leşkerî ji holê rabin. Dema wan pêşkêşî dadgehê dikin, em jî li dadgehê beşdar dibin.

P5-Miletê me yê kurd, ne tenê tê girtin, lê belê çewsandinin din jî hene, gelo ji bo wan we çi kiriye?.

B5- Belê, berî dora heşt mehan em aqedarbûn ku wê rîjêm Ereban ji Şeddadê werîne herêma **Dêrikê**, xakê li wan belav bikie, berî her kesî, me ev nûçe di enternetê de belav kir û dijî vê biryarê rawestan û me da xuyakirin ku gundî û cotkarên **Dêrikê** pidiviyê vê xakê ne. Ji bo zawayiyê jî, me daxuyanek derxist, û gereke destelat çareserkirinekê ji rewşa welatiyan re bibîne û li wan xwedî derkeve.

P6- Danûstandinên we bi rîjîmê re bi çi rengî ne?.

B6-Ti danûstandinên suruştî nîn in, hevalên me ji bal dezgehên Parastinê tene xwestin û ew lêkolînan bi wan re dikin, ya din, hin ji hevalên me ji bo derketina derveyî welêt berbendkirî ne, ango nahêlin ew beşdariyê di kongirên li deverna çêdibin beşdar bibin. Û eger ew li wan beşdar bûn jî, ew wan dixwazin û pirs û lêkolînan bi wan re dikin. Weke nimûne, berî demekê, Serokê saziyê ji bal parastina (EL-CEWIYYA) ve hate xwestin, nêzîka heftiyekê her roj ew dibirin, sibehî digotin êvarî were, û êvarî jê re digotin sibehî were!! Weke min got, em eşkere ne, tozika me di enternetê de belav bûye, navê endamên encumena giştî di enternetê de hene û di her demekê de heye ku em bêne girtin .

P7-We beşdarî di kîjan kongirê rêxistinên mafên mirovan de kiriye?.

B7- Belê, hevalên me li (Rebatê, Istembolê, Qahireyê, Lubnan û 4caran jî li Urdunê amade bûne.

P8- Têkiliyê we bi tevgera kurdî re, bi çi rengî ne?.

B8- Dema me saziya xwe damezrand, em

çûn ba piraniya partiyên tevgera kurd, me ji wan re da xuyakirin ku em saziyeke mafê mirovane û em cihê wan nagirin

ji ber ewin yê nûnertiya gelê me dikin û em ji wan re piştgirin, çimkî em jî parçek ji gelê kurd in.

P9-Hun çi daxwazê ji tevgera kurdî dikin?.

B9-Berî her tiştî, em doza avakirina lêvegereke kurdî û yekbûna peyva kurdî dikin, em dixwazin ew nêzîkî hev bibin, ji ber ku em ti sûtê ji gotinên qelew wernagirin, ne tenê wilo, ew zîyanê dighênin pirsgerêka gelê me ya dadmend, ne avakirina lêvegera kurdî, bêaramiyekê li ba me çêdike.

P10- Hun şaşiyê li kû derê dibînin mamoste, ez naxwazim tu bi nav bikkî?.

B10-Lingê min neyêxe soleke teng de(Bi ken), tişteki tenê ez dixwazim bêjim, gerek partiyên me ji gel re kar bikin ne ji partîtiyên xwe re, çi gaveke merov bide, gereke doza gel ew ya herî li pêş be.

P11-Gelo têkiliyên we bi saziyên Erebi yên mafê mirovan re hene?.

B11-Belê hene, ev kar bi hin hevalin min ve girêdayî ye. Pêşinyarek ji bo avakirina toreke mafên mirovên kurd li ba me heye. Ya dî, me daxwaza xwe daye fidraliya dewlî, da em tede bibin endam. Ji bo saziyên Erebi, çi saziyek nerîna wê li doza gelê me ne nerînek şoven be, em têkiliyan pêre saz û avadikin:

D.R.(11)